
# Rapora Min ya Kar û Xebatên YMKê
## 2022

1. Li roja yekşemê 21.01.2022an ji ber mijara destgîrkirina mamosteya zimanê kurdî mamoste Zara Mohamedî, me peywendî bi malbata wê kir û me helwîsta YMKê ji wan re ragehand. Me ji wan re got; ku me kongireya xwe ya 17. Li ser navê navê Zara Mohamedî encamp daye û ji wê re kiriye diyarî ye. Ji aliyekî din ve me piştevaniya xwe ji doza rewaya mamosteyê re ragehand.

2. Li roja pêncşemê 03.02.2022 ji demjimêr 19.00-20.30 bi rêya pirogramê Zoomê komeleya me – YMK- bi nûnerayetiya mamosteyan Samir Kheder Abde, Abdukadir Ulumaskan û Nersrîn Miro di gel Civaka Kurd li Almanya bi nûnerayetiya birêzan (Mehmet Tanriverdi, Özgür Kara û mamoste Lilan) û komeleya Ronahi bi nûnerayetiya Xatûn Xunav Haco civînek encam da. Di civînê de ev xalên li jêr hatine gengeşekirin:



a. Herdu birêzan Abdukadir Ulumaskan û Samir Kheder behsê rewşa YMKê û zimanê kurdî kirin. Ew pirsgirêk û astenigiyên di nava karê me de hatin behs kirin.

b. Birêzan Mehmet Tanriverdi û Xatûn Xunav Haco pîrozbahiyên xwe pêşkêşî rêveberiya nû ya YMKê kirin û piştevaniya xwe anîn ziman.


c. Rewşa YMKê û astengiyên di rêka me de mijarên sereke yên civîna me bûn. Her yek ji aliyê xwe vê dê hewl bide ku rawşa zimanê kurdî baştir bibe. Civaka Kurd li Almanya dê daxwazê ji endamên xwe bike ku li ser vê mijarên kar bikin.

d. Di vê civînê de ev biryar û pêşniyar hatine dan/kirin:




   1. Piştî çar hefteyên din civînek din bê encamdan. Birêz Mehmed dê di van rojên li pêş me de du rojan pêşniyar bike û ji me re bişîne.
   2. Eger navê Komeleya me Yekîtiya Mamosteyan li Ewrûpa be, Ew nikare bibe endama Paritätischer Wohlfahrtsverband. Daku YMK bikare bibe endama Paritätischer Wohlfahrtsverband gereke navê Ewrûpa ji navê wê vebe, ji ber vê yekê pêşniyar hate kirin ku komelek nû bi navê Yekîtiya Mamosteyan li Almanya ser bi YMKê ve were damezrandin. Bi vî awayî dê baştir bikare pirojeyan pêşkêş bike.
   3. Navên wan bajarên ku rêjeya kurdan lê zor e û dersên kurdî lê tune ne were nivîsên ku li wan deran xebatên ji bo dersên kurdî bên kirin.
   4. YMK bibe endama Civaka Kurd li Almanya? (Rêveberiya YMKê dê vê biryarê bide!)

3. Di 15.02.22an de Komeleya Ronak, Yekîtiya Mamosteyên Kurd û mamosteyê kursan Muhemed Keleş, di rêya Zoomê re hevdîtinek bi dêûbavên zarok û ciwanan re li dar xist.



Bi boneya bi dawîhatina kursên Seretayî 1 û 2 yên zarok û ciwanan û destpêkirina kursine nû ji bo fêrbûna zimanê kurdî, ev hevdîtin hat lidarxistin.
Kursên nû, yên ku wê bêne pêşkêşkirin, ev in:
-Seretayî 1
-Seretayî 2
-Seretayî 3
Hejmara zarok û ciwanên beşdarbûyî: 100
Temenên wan: ji 6 ta 14an

4. Li Roja înê 18.02.2022an **rojnameya WAZ** li dibistana Hans Tilkowskî seredana dersa zimanê kurdî kir. Me di hevdîtinê de base dersên zimanê kurdî kir û awayê birêveçona dersan û pirsgirêkên me, mijarên sereke bûn.


WAZ HERNE & WANNE-EICKEL Donnerstag, 24. Februar 2022

KOMPAKT

Schüler lernen ihre Muttersprache

Immer mehr Kinder und Jugendliche mit Migrationshintergrund wollen ihre Kenntnisse erweitern oder verbessern. Ein Besuch in einer Kurdisch-Stunde

„Viele der Eltern sind Analphabeten, durften in ihrer Heimat zum Teil kein Kurdisch sprechen."

WAZ Herne

Jetzt Fan auf Facebook werden!


So lernen Schüler in Herne ihre Muttersprache im Unterricht

WAZ

Aktualisiert: 23.02.2022, 16:15 | Lesedauer: 5 Minuten

Nikolina Miscevic

Samir Kheder Abde unterricht Kurdisch als herkunftssprachlichen Unterricht an der Hans-Tilkowski-Schule in Herne.

HERNE. Immer mehr Schüler mit Migrationshintergrund lernen in der Schule auch ihre Muttersprache. Wir haben eine Kurdisch-Stunde in Herne besucht.

5.Li 19.02.202 … ikê/ Roja Cîhanî ya Zima … ser kenala **Çira TV** bi aw …












ç

6. Li 20.02.2022 li dor giringiya zimanê dayikê/ Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê,, hevpeyvîneke me li ser Radyoya **Cosmo Kurdî** bi awayê hat sazkirin.




7. Li 22.02.2022 i Komeleya Ronak civînek di derbarê zimanê Kurdî de û çalakkirina rola malbatan hate lidarxisitin.

8. Li roja yekşemê 13.03.2022an ez li çalakiya Komeleya Ronahî li bajarê Bochumê amade bûm.

9. Ji ber piştevaniya darayî ya Civaka Kurd li Almanya ji bo ferhenga Kurdî Almanî- Almanî Kurdî yan herdu mamosteyan Abdukadir Ulumaskan û Cahit Kaplan, nemeyeke spasiyê ji bo Civaka Kurd li Almanya hat nivîsên û şandin.

10. Li roja pêncşemê 31.03.2022 peywendîkirin bi Dr. Leyla Ferman li dor pirojeya komelkujiya Êzidiyan. Di wê peywendiya telefonî de birêz Dr. Leyla piştevaniya me ji bo vê pirojeyê xwest.

11. Ji ber wê pirojeya me bo Zanîngeha Dihokê pêşkêşkirî, li roja înê 01.04.2022 me peywendî bi birêz Dr. Emîn kir. di encamp de birêz Dr. Emîn got: Em hê li ser pirojeyê kar dikin.

12. Li roja înê 22.04.2022an min û mamoste Keleş reşnivîsek ji bo bawernameyên kursên online amade kir.

13. Li roja duşemê 02.05.2022an ji bo amadekariyên bidawîanîna kursên online û Roja Zimanê Kurdî me bi rêya Zoomê civînek lidarxist. Li ser navê YMKê ez û mamoste Îlyas amade bûn. Li dawiya civîna ev bername hate danan:

    - Bername wê di saet 18:00’an (15.05.2022) de dest pê bike.

- Stranekê li ser zimanê kurdî (Mamoste Keleş wêdestnîşan bike)
- Mamoste Keleş vê panelê bi rê ve bibe.
- Destpêkê mafê axaftinê ji Mamoste Keleş re ye. (Li ser Kursên hatine dayîn û tên dayîn çendmijaran bîne ziman. Herî zêde 5 deqe/xulek.)
- Duyemîn mafê axaftinê ji YMKê re ye. ( Li ser taybetmendiya 15ê gulanê û giringiya ziman.  Herî zêde 5 deqe/xulek.)
- Sêyemin mafê axaftinê ji Komela Ronak re ye. (Mijar û axaftvan biryara komelê ye.  Herî zêde 5 deqe/xulek.)
- Wêne û dîmenên beşdarvanan wê werepêşkeşkirin ( Mamoste Keleş dîmen û wêneyêndi destên xwe de ji mamoste Semir re bişîne. Mamoste Semir jî kurtevîdeoyekê amade bike.)
- Mûzîk (Mamoste Keleş bi beşdarvanan re bikevetêkiliyê û ji bo mûzîkê kesen dilxwaz hilbijêre. 1-2 stranan)
- Navên Serkeftiyan were xwendin ( 5 Komênaktîf/çalak hene. Ji her komê 2 kesên herî serkeftîji aliyê mamoste Keleş ve were destnîşankirin û xelat were dayîn. Ji bo xelatan pênûs an jî pirtûkhatin pêşniyar kirin.)
- Ji beşdarvanan û malbatên wan re mafê axaftinê(Mamoste Keleş kesên ku biaxivin destnîşanbike. Herî zêde 20 deqe/xulek.)





Kesên ku di civînê de amade bûn ev kes in;
Mamoste Semir Xidir û mamoste Ilyas li ser navê YMK û Mamoste Xoşnav û Mamoste Keleş li ser navê Komeleya Ronak.

14. Li roja sêşemê10.05.2022an bi rêya Zoomê me wek komisyona meteryalan ya asta navîn civîna xwe ya yekemîn saz kir. Beşdar (Ez, mamoste Şefîq, Yusif û Mehmûd)

15. Li roja çarçemê 11.05.2022an me bawernameyên beşdarên kursên online çap kirin û li dawiyê me mor û îmze kirin.

16. Li roja înê 13.05.2022an me 10 sêtên pênûsan wek diyarî ji bo serkeftiyên kursên online kirîn.

17. Ji bo bilind nirxandina Roja 15ê Gulanê, Roja Zimanê Kurdî li 15.05.2022an ahinga bidawîhatina pênc kursên zimanî bi rêya online hate sazkirin. Me bi navê YMKê peyvek pêşkêş kir. Û tê de giringiya roja Zimanê Kurdî anî ziman û serkeftin û berdewamî ji hemû beşdaran re xwest. Me spasiya hemû dêûbav û mamosteyê kursan kir.

18. Li roja înê 20.05.2022an me (Ez, mamoste Emîn û mamoste Yusif) li ser Zoomê hevdîtinek bi berpirsiyarê pirtûkxaneya online MAKê birêz Qeyso re saz kir.

19. Li rojên 27-28.05.2022an li bajarê Hattingen/Bildungswerk-Hattingen me beşdarî di simînara GEWê de kir. Min simînarek li dor lêkerên gerguhêz û lêkerên negerguhêz/ karên têper û karên têneper ji bo amadebûyan pêşkêş kir.



20. Li roja şemiyê 04.06.2022an me (Ez, mamoste Emîn, Abdulqadir û Yusif) beşdarî di taziya Xwedê jê razî bavê hevalê me yê rêvebiryê mamoste Mehmûd de kir.

21. Li roja pêncşemê 09.06.2022an civîna Komxebat 2an-Asta Navîn (Ez, mamoste Mahmûd, Yusif, Şefiq, Şerif, Abdulkadir) hat çêkirin. Di civînê de biryar hat dayin ku komxebata ji bo polên 5/6 pirtûkekê amade bike û ji bo destnîşankirina mijarên pirtûkê Komxebat di 28.06.22 li Duisburgê bicive.

22. Li roja sêşemê 28.06.2022an li bajarê Duisburgê me wek komisyona meteryalan ya asta navîn civîna xwe ya duyemîn saz kir. Beşdar (Ez, mamoste Şefîq, Yusif û Mehmûd)

23.

24. Li roja sêşemê 28.06.2022an ji bo karên qeydkirina rêveberiya me ya nû û herwiha pesendkirina guhertinên destûrê YMKê ez çûme cem Notarî li bajarê Bergisch Gladbach û min belgeyên pêwîst îmze kirin.

25.

26. Li roja înê 08.07.2022an ji bo pîrozkirina Kongireya 11an ya PENa Kurd me bi rêya birêz Dr. Zerdeşt Haco nameyeke pirozbahiyê ji kongireya wan re şand.

27. Li roja înê 26.08.2022an me peywendî bi nûnerê Rêvebirya Xweser a Bakur û Rojhilata Sûryê hat kirin.

28. Li roja duşemê 29.08.2022an min seredana Komeleya Ronak li bajarê Bochumê kir. Çend bawernameyên kursa online min îmze kirin.

Têkilî bi Zanîngeha Dihokê re:

29. Li roja yekşemê 08.05.2022an bi navê YMKê min nameyek bi rêya Messengerê ji birêz Dr. Dawood Atruşî serokê Zanîngeha Dihokê re şand. Di vê nameyê de min amaje bi wê yekê kir ku YMKê ji bo berhevkirina memosteyan pirojeyek li tebaxa 2021an bi rêya birêz Dr. Emîn serokê Senterê Ziman li Zanîngeha Dihokê pêşkêşî Zanîngeha Dihokê kiri bû. Ji ber vê yekê û rewşa zimanê kurdî li almanya bi giştî min daxwaz ji birêzî kir ku em hev bibînin. Lê mixabin ji ber karên wî û nebûna delîveyek guncayî me nikarî hev bibînin. Lê birêz Dr. Dawood soz da ku ew dê di demeke nêzîk de bi me re bikeve têkiliyê. Wek soz daye me, piştî vegeryaye Kurdistanê peywendî bi min kir û soz da ku ew dê bi cidî li ser vî pirojeyî kar bike. Piştî vê peywenduyê, min pewendî bi birêz Dr. Emîn jî kir û birêzî careke din pirojeya me di bin çavan re derbas kir û hindek guherîn li gor sîstema Zanîngeha Dihokê û guncandin di gel sîstema standarta Ewropî li ser kirin. Em çendîn caran bi hev re ketin têkiliyan û civînek taybet li Zanîngeha Dihokê di navbera herdu birêzan Dr. Dawood û Dr. Emîn de hat sazkirin. Piştî civînê jî Birêz Dr. Emîn peywendî bi min kir û got em dê li ser vê mijarê bi wan zanînîngehên Welatê Almanya, ew yên we ji me re pêşnyar kirîn bikevin têkiliyê. Lê mixabin heta niha encamek tune ye.



30. Li roja sêşemê 06.09.2022an me rapirsiyek onlayn ji bo mamosteyên Zimanê Kurdî. Heta niha 14 mamosteyan agahî dane.

31. Bi helkefta destpêkirina sala nû ya xwendinê birêz Murat Mang ji Rojnameya Politika hevdîtinke bi me re çêkir.



Politika

# Tenê 3200 xwendekarên Kurdî hene

**Nûçeyên Çand/Huner** —

Duşem 19 Îlon 2022 - 22:00

- **Malbatên me dersên Kurdî weke yên Elmanî, Bîrkarî û Ingilîzî mecbûrî nabînin. Divê malbat xwe ji vê yekê berpirsyar bibînin û hay ji giringiya ziman hebin.**

**MURAT MANG**

Kurdên ku li Dîasporayê, bi taybet jî yên li Elmanyayê, derfetên wan yên ku di dibistanan de dersa Kurdî bixwînin, hene. Lê divê meriv bipirse



## Dersên Kurdî li van eyaletan hene

Li Elmanyayê pirsa perwerdeyê piştî perwerdeya destpêkê, karê eyaletan e. Yanî eyalet li ser wê yekê biryarê didin ka ew ê derseke zimanê xelkê ji welatên din hatiye li mufredata xwe zêde bikin yan na. Eyaletên dersên zimanê Kurdî îro roj li wan hene evên li jêr in:

*1. Bremen, ji sala 1993´yan ve.*

*2. Hamburg, ji sala 1995´an heta sala 2005'an dersên Kurdî lê hebûn. Heger malbat doza dersan bikin, sinif dikarin dîsa bên amadekirin.*

*3. Niedersachsen, ji 1995´an ve.*

*4. Nordrhein-Westfalen NRW, ji sala 1996´an ve*

*5. Rheinland-Pfalz, ji sala 2018´an ve*

*6. Berlin, ji sala 2019´an ve.*

*7. Brandenburg, ji sala 2020´an ve.*

https://kurmanci.ozgurpolitika.com/nuceya-tene-3200-xwendekaren-kurdi-hene-167929

32. Li rojên înê û şemiyê 11-12.11.2022an me beşdarî di simînara GEWê li bajarê Hattingen de kir. Me mijarek li jêr navê „Waneyên Digîtal“ ji beşdaran re pêşkêş kir.














33. Li roja yekşemê 30.10.2022an bi hevkarî di gel Komeleya Ronak, şeş kursên zimanê Kurdî yên onlayn ji bo mamoste Mihemed Keleş hatin vekirin. 184 xwendekar beşdarî van kursan dibin. Ew jî bi vî awayî tên dabeşkirin; Ji bo mezinan asta yekem: 55 xwendekar, asta duyem: 35 xwendekar û asta sêyem: 24 xwendekar. Ji bo zarokan seretayî 1: 15 xwendekar, seretayî 2 : 30 xwendekar û seretayî 3: 25 xwendekar.




34. Li roja înê 02.12.2022an ji bo pîrozkirina Kongireya KNKê, me nameyeke pirozbahiyê ji kongireya wan re şand.

35. Li roja yekşemê 11.12.2022an ji bo gengeşekirinê li ser rewşa kurdên dîyasporayê, Kurd Akadê çendîn saziyên Akadîmî û pîşeyî li hev civandin û çaremîn civîna saziyên Akadîmî hat lidarxistin. Me jî wek YMK mijarek li jêr navê “Zimanê Kurdî li Dîyasporayê” pêşkêş kir.



36. Ji bo xebata xebata Gencîneya Peyvên Bingehîn, zaravayê Soranî me (mamoste Nihal, mamoste Dilşad Xoşnaw û ez) çendîn civîn li dar xistin. Me beşa Soranî du caran di bin çavan re derbas kir.

2022

Semîr Xidir Abdî

Serokê YMKê